

BAHOZ ŞAKIR

EVİN ÜCENG

الحب و الحرب



باهوز شاکر

ترجمة فاطمة حسين

Evîn û ceng

Nivîser:bahoz Şakir

Weger ji kurdî: fatma hisên

Berga pirtûkê :Azad Helinc

Çap: iliktironî pdf

الحب والحرب

مؤلف: باهوز شاكِر

ترجمة من الكردية إلى العربية: فاطمة حسين

غلاف الكتاب: أزاد حنّج

طبع إلكتروني

Dîyarî

bo aşiqên weke bavê min

Yên ku rihê wan bi xwedê de girê dayî

Yên ku navê xwedê li ser zimanê xwe peyanakin . Ewên ku
. xwedê ji xwe nêziktir dibînin û, êvarê bi semaya Eşqê şêndikin

إهداء

إلى الأشخاص الذين من أمثال أبي
الذين روحهم متعلّقة بالله
الذين لا يسقط اسم الله على لسانهم
الذين يرون الله أقرب لهم من أنفسهم
ويبهجون اللّيل برقصة العشق

Evîn û ceng
الحبّ والحرب

Pêşgotin

Evîn û ceng her du jî li jîyanê weke nênûk û goşte lê evîn her ji cengê bihêztir e ceng derzîya piştta mirovan diderizîne lê bi hilmisîna bayê evînê her tişt tê cebirandin wek xebrîyêl xarsa markîz dibêje her dem bawerîya min hebû ku evîn dikare mirovahîyê ji

şehetîne rizgar bike û her wiha mirov çiqas hezbike xwe nêzî eşqê bike her wiha eşq jî xwe ji çavê mirovan nêziktir dike , ceng wek pençeşêrê xwe berdide cendekê bajêr hêdî hêdî bedewîyê ji bajêr didize penaberî xizanîyê dafirîne rumetê ji rûyê însanan radike bêrumetê li şûnê rêdixîne , evîn û ceng di derbarê gelek tiştan de dipeyive û xwendevanê ku bixwîne wê di her alî de xwe bibîne çi di cengê da û çi di evînê da

26/11/2020

KOBANÎ

مقدمة

الحبّ والحرب كلاهما في الحياة مثل الظفر واللحم بيّد أنّ الحب أقوى من الحرب، الحرب تُصدّع عمود الفقري للإنسان بيد أنّ لمسة من هواء العشق تجبر كلّ شيء مثلما يقول كابريل كارسيا ماركيز:

لقد كنت مؤمناً على الدوام بأنّ الحبّ قادر على انقاذ الجنس البشريّ من الدمار .
كذلك الأمر كلما أحبّ المرء التقرب من العشق كلّما أحبّ العشق التقرب لعينيه أكثر فأكثر

الحرب مثل السرطان تتسلّل إلى جثّة المدينة رويداً رويداً، تسرق الجمال من المدينة، تخلق الفقر والتشرّد، تزيل الكرامة من وجه الإنسان، تمدّ الذلّ بدلاً من الكرامة

الحبّ والحرب يتطرقان العديد من المواضيع .

الشخص الذي سيقراً هذا الكتاب سواء إن عاش في الحرب أو الحبّ سيجد نفسه في هذا الكتاب

2020/11/26

كوباني

Beşê yekê
فصل الاول

Ferhenga Eşqê
قاموس العشق

Em naghêjin hev
weke payîz û buharê
,weke jiyan û mirinê
em naghêjin hev
weke ez û tu
weke Ehrîman û Xwedê
em naghêjin hev

لن نتلاقى

مثل الخريف والربيع

مثل الحياة والموت

لن نتلاقى

مثل أنا وأنتِ

مثل أهريمان والرب

لن نتلاقى

Vexwerina caxreya aşiq
cûda ye
peyal di nav lêvên aşiq da
berî aşiq serxweş e
awirên aşiq
meşa wî
kenê wî
axaftina wî
her tişt di cendeka aşiq da cûdaye

طريقة تدخين العاشق

مختلفة

الكأس بين شفتي العاشق

ثمل قبل العاشق

نظرات العاشق

مشية العاشق

ضحكة العاشق

حديث العاشق

كل شي مميز في جسد العاشق

Eşq giyana xwedê
li ser sûfetê gerdûnê ye
eşq weke xwedê nayê xuyakirin
û xuya nabe

العشق روح الله

في الكون

العشق مثل الله لا يُرى

ولن يُرى

Xweziya eşq

weke me însanan ba

wê demê dê zaniba halê aşiq çiyê di eşqê da

ألا ليت العشق

كان مثنا

عند ذاك كان سيدرك

ما هو حال العاشق

في العشق

Eşq ku serma ba
wê mirovan seqem daqultanda
eşq ku agir ba
wê mirovan xwe di êgir da bihilan da

إن كان العشق برداً
كان الإنسان التهم الصقيع
وإن كان العشق ناراً
كان الإنسان أذاب نفسه في النار

Ji aşiq re nebêjin
ev eşq ji te ra nabe
yan tu dixwazî
ew bi peyala meyê
di zîqaqan da bifertile
yan tu dixwazî
ew nivîna xwe
di dînwaneyê da rêxîne
yan tu dixwazî
ew mirî li jiyanê be

لا تقل للعاشق
لا يناسبك هذا العشق
إمّا أنّك تريده
أن يعرّب في الشوارع
مع كأس الخمر
إمّا أنّك تريده
أن يبسط سريره في مشفى المجانين
إمّا أنّك تريده أن يكون
ميتاً في الحياة

Her ku mirov
di hezkirinê da kûr diçe
her wiha
mirin tevî jiyanê nêzik dibe
her ku mirov
ber ve naskirina xwe diçe
her wiha hezkirinê
tevî xwedê nas dike

كَلِّمًا تَعَمَّقُ الْإِنْسَانَ فِي الْحَبِّ
يَقْتَرِبُ مِنَ الْمَوْتِ وَالْحَيَاةِ سَوِيًّا
كَلِّمًا اقْتَرَبَ الْإِنْسَانُ مِنْ مَعْرِفَةِ نَفْسِهِ
اسْتَطَاعَ مَعْرِفَةَ حَبِّ وَاللَّهِ

Di jiyana evînê da
vexwarina şerabê cûda ye
axaftin
meş
livandina tilîyan
nêrînên çavan
rakirina peyalê
xew
xewn
,tevahî jiyana cûda ye

في الحبّ

احتساء الشراب مميز

الكلام

المشي

تحريك الأصابع

نظرات العيون

إمساك الكأس

النوم

الحلم

برمته مختلف

Bayê eşqê ji imir carek e
ku tu nedildarekî hilawartî bî
hezkirina xwe nekî armanc
dê te bişewitîne
biteqîne
dojehê di jiyana te da biçîne

العشق يأتي مرة واحدة في الحياة
إذا لم تكن عاشقاً مميزاً
ولم تضع حبك نصب عينيك
سيحرقك
سينهبك
سيجعل حياتك جحيماً

Evîn weke top rîhanê ye
ku tu tîbûna wê neşkênî
wê biçilmise
ji hev bikeve
evîn şorş e
ku tu neşorişger bî
tu yî weke xweyê ku di avê da bihile
Tu yî di evînê da bihilî
evîn dengvedana şevê yê
ku tu nepasvan bî
,wê ji te bê dizîn e

الحب مثل ریحان
إذا لم تروِ ظمأه
سيزبل
سينكسر
الحبّ ثورة
إذا لم تكن ثائراً
ستكون مثل الملح الذي يذوب في الماء
ستذوب في الحبّ
الحبّ صدى اللیل
فإذا لم تكن حامياً
سيُسرق منك

Eşiq nahêle ku mirov
çavên xwe di şevê da bîne hev
eşiq dermanê gelek nexweşiyên e
û nexweşîyek e derman jê ra tune ye

لا يسمح العشق للمرء
أن ينام قرير العين
العشق دواء لكلّ داء
وداء ليس له دواء

Du aşiq
ku ji hev dûr bin
navbera wan û cihenemê bihistek e
du aşiq
ku negihêjin hev du
dînbûn di nava xwîna wan da dimeşe
du aşiq
ku gotinan ji zimanê hev didizin
li dervayî jîngehê hev dibînin
du aşiq
ku hev hembêz dikin
mirina xwe di hembêzê hev da dixwazin

العاشقان

إن ابتعدا عن البعض

يفصلهما والجهنم خطوة

العاشقان

إن لم يلتقيا

الجنون يجري في شريانها

العاشقان

إن يتبادلا الأحاديث

يلتقيا خارج الكون

العاشقان

إن احتضنا

يتمنيا الموت في أحضان بعضهما

Evîn jîyan e ku yar
destên xwe bi ser porê te ra bixweşîne
evîn buhişt e ku yar
te li ser sîngê xwe mexel bike
evîn bapêç e ku yar
bihna xwe di te da biperçiqîne
evîn dojehe ku yar
te di nava arê evînê da bihêle
û te ji xwe rêzgar bike
evîn mirin e

الحبّ حياة

إذا الحبيب مسح بيده شعرك

الحبّ جنة

إذا الحبيب جعل من صدره راحة لك

الحبّ عاصفة

إذا الحبيب مزّق رائحته فيك

الحبّ جهنم

إذا الحبيب تركك بين نيران الحب

ولم يحررك من ذاته

الحبّ موت

Halê aşiq

,weke çarîna baba tahir oryanî ye

aşiq ew e ku her dem bi bela be

mîna eyûb bi kurman mopitela be

weke hesen bimûşe tasa jehrê

,mîna husên şehîdê kerbela be

حال العاشق

كرباعية بابا طاهر العرياني

العاشق مبتلي بكلّ الأوقات

مثل أيوب مبتلي بالديدان

مثل حسن يشرب كأس السمّ

مثل حسين شهيد الكربلاء

Germahiya dilê aşiq
weke dînbûna rojê
di germa havînê da
mêjiyê aşiq
tişteki bi tenê tê da dizivire
ew jî hervîna wî ye

فوران قلب العاشق
مثل جنون الشمس
في حر الصيف
عقل العاشق
يدور فيه شيء واحد
ألا وهو حبّ الأول

Çavên aşiq
şîn e weke ezîman
guhên aşiq
bi ayetên evînê paqij bûne
zimanê aşiq
ji baskên parwanê naziktir e
gotinên aşiq
pend û şîretên pêşîyan in
destên aşiq
dixwaze rûyê evînê
şerabê hembêz bike
lingên aşiq
ji sînorên ku xwedê ji eşqê ra çêkirî
,ji nexşeya wê dernakeve

عينا العاشق
زرقاوتان مثل السماء
أذنا العاشق
ممسوحتان بآيات العشق
لسان العاشق
أرق من جناحي الفراشة
أحاديث العاشق
حكم وأمثال الأجداد
يدا العاشق
تريدان وجه الحب
تحضنان الخمر
قدما العاشق
لا تتجاوزان حدود الخريطة
التي خطها الله للعاشق

Evîn bi meyê hatiye şûştin
lewra serxweşbûn
,xwe li mêjiyê mirovan dipêçe
evîn bi destê xwedê hatiye afirandin
,lewra li ser devê aşiqan bûye tesbîh
pirtûka ola evînê helbest e
û desmêja xwe bilor û mûzîk e

الحب قد عُسِلَ بالخمر
لذا السكر
يُلفّ حول عقل الإنسان
الحبّ قد خُلِقَ بيد الله
لذا أصبح التسبيح على فم العشاق
كتاب دين الحبّ شعر
ووضوءه البلور والموسيقى

Kordil

ji dil bêtir nabîne

ku dikeve êşê

ji êşa xwe bêtir

êşa tu kesî nabîne

ku peyalekê ji hezkirinê vedixwe

dixwaze bifire

û hemî însanan bi xwe re bifirîne

أعمى القلب
لا يرى سوى القلب
إذا يتألم
لا يرى ألم أحد
سوى ألمه
إذا يشرب من كأس الحب
يريد التحليق
ويخلق الجميع معه

Eşq ji bo rih hatiye
evîn ji bo dil
eşq tabiloya jiyanê ye
evîn zanîngeh e
eşq olek e bi serê xwe ye
evîn pirtûka wê ye

العشوق خصص فقد للروح

الحبّ لأجل القلب

العشوق لوحة الحياة

الحبّ جامعة

العشوق دين بحد ذاته

الحبّ كتابه

Ji dil ra sanciyek heye
dema ku dîlber destên xwe
ji nava destên dil vedikşîne
ji dil ra sanciyek heye
dema ku dîlber destên xwe
dervayî çemê dil dişo

للقلب مغص

عندما تسحب الحبيبة

يديها من يد القلب

للقلب مغص

عندما تغسل الحبيبة

يديها خارج نهر القلب

Ger ne evîn ba
wê gozemîn bi xwînê bata şuştin
ger ne evîn ba
ken di lêvên însanan da xuya nedibû
ger ne evîn ba
gul di gulistanan da nedibişkivîn
ger ne evîn ba
sorbûn ji lêvên keçikan ra çênedibû
ger ne evîn ba
ji rojên salê rojek nedibû
cejina evînê

لو لم يكن الحبّ
لكان الكون غارقاً بالدم
لو لم يكن الحبّ
لما كان الضحك ظاهراً على وجه الإنسان
لو لم يكن الحبّ
لما نبتت الورود في الحديقة
لو لم يكن الحبّ
لما ناسبت الحمرة
شفاه الفتيات
لو لم يكن الحبّ
لما كان في أيام السنة عيداً

Lezeta hezkirinê
wek lezeta buhiştê ye
tu dibîsî
lê nabînî
li ser dixwînî
lê nizanî çawa ye
bi wate ye
Lê bêşîrove ye

لذّة الحبّ

مثل لذّة الجنّة

تسمع

ولكن لا ترى

تقرأ عنها

لكن لا تعرف كيف تكون

ذات معنى

لكن لا تشرح

Mey û evîn
weke hev in di jiyânê
mey û evîn
di çavê aşîq da
ji hev necûda ne cêwî ne
mey û evîn
ku nepîroz bana
xwedê bi pênûsê ra nedigot
binivisîne mey û evîn

الخمير والحبّ

متشابهان في الحياة

الخمير والحبّ

لا يختلفان في عين العاشق

إنّما توأمان

الخمير والحبّ

إنّ لم يكونا مقدسين

لما قال الله للقلم

اكتب الخمير والحبّ

Mirovê dilreş
ku pijjîkên dunyayê
hemî li dor dilê wî bicivin
nikarin mîna serê derziyê
dilê wî paqij bikin
tenê evîn dikare
wî dilî ji berfê sipêtir bike
ji ber ku evîn û xwedê yek in

الإنسان الحاقدا
اذا اجتمع جميع أطباء العالم حوله
لا يستطيعون مثل رأس الإبرة
تطهير قلبه
وحده الحب قادر
على جعل ذاك القلب
أكثر بياضاً من الثلج
لأنّ الحبّ والله واحد

Ku hezkirin kirasek ba
qalanê wê çavê min ba
min ê bida
ku hezkirin gulek ba
min ê destên jiyana xwe
di dargeha gulistanê da kelepçe kiriba

إن كان الحبّ فستاناً
وكانت عيناى مهرة
لمنحته
إن كان الحبّ وردة
لقدت يدا حياى
فى باب الحديقة

Ku jiyânê xwe li te pêçand

Weke gorê

dargeha dilê xwe

ji çiraxa buhiştê re veke

evîn çiraxa buhiştê ye

إذا التفت الحياة
حولك مثل القبر
افتح باب قلبك
لمشكاة الجنّة
الحبّ مشكاة الجنّة

Evîn dilbaran e
ji kewserê tê
pîvandin ji bejina evînê ra tune ye
weke pirtûka xwedê
sal bi sal şîroveyeke nû
jêre çêdibe

الحبّ قلب المطر
يأتي من الكوثر
لا يوجد مقياس لطول الحب
مثل كتاب الله
عام بعد عام
يضعون له
شرح جديد

Evîn dengvedana helbestê ye
helbest dengvedana awazê ye
helbest û awaz
evînê di navbera xwe da
dibin û tînin
ne awaz jê têr dibe
û ne helbest jê têr dibe
her tişt diçe
cîhan vala dibe
evîn bi tenê dimîne

الحبّ صدى الشعر
الشعر صدى اللّحن
الشعر واللّحن
يأخذون الحب ويأتون به
لا اللّحن يشبع منه
ولا الشعر يشبع منه
كلّ شيء يُفنى
يُفرغ الكون
يبقى الحب وحده

Evîn dibistan e
tu şagirt î
evîn pirtûkxane ye
tu xwendevan î
evîn şoreş e
tu şoreşger î
evîn ji çelengiya jinê ye
jin dil dagir dike

الحبّ مدرسة

أنت الطالب

الحبّ مكتبة

أنت القارئ

الحبّ ثورة

أنت الثائر

الحبّ من جمال المرأة

المرأة تُوسر الحبّ

Bi qasî temenê xwedê
bi qasî hejmara însanan
ji adem heta niha
bi qasî stranên evînê
bi qasî şehîdên welatê xwe
ji te hez dikim

بعدد سنين عمر الله

بعدد البشرية

من آدم حتى الآن

بعدد أغاني الحبّ

بعدد شهداء وطني

أحبّك

Li vî bajarî

dil tevî bajêr dişewite

Li vî bajarî

helbest bi ser şewata dil da digirî

Û awazan ji hêsrên xwe diafirîne

في هذا البلد
يحترق القلب مع البلد
في هذا البلد
يبكي الشعر
على حرقه القلب
ويؤلف الأغاني
من دموعه

şikestina navê evînê
bi çelengiya te tê cebirandin
birîna li sîngê evînê
bi bayê porê te
tê kewandin

انكسار اسم الحب
يجبر بجمالك
جرح على صدر الحب
يكوى
بنسمة شعرك

Di kaşgêra evînê da
ez xewna xewa te me
di kaşgêra evînê da
ez sebra dirêjahîya rê me
di kaşgêra evînê da
serê te li ser milê min
û bihna porê te
mêjûyê min sermest dike

في قطار الحبّ
أنا حلم منامك
في قطار الحبّ
أنا الصبر طول الطّريق
في قطار الحبّ
رأسك على كتفي
ورائحة شعرك
تسكر عقلي

Destê xwe bi ser dilê xwe de
wek gerînekê
li dor dil bifertile
wek gerdûşê bédeng
fitefîta dil bibîse
ji ber ku eşqa rast ew e

ضع يدك على قلبك

مثل دوامة مائية

در حول القلب

مثل المتصوّف الصامت

اسمع نبض القلب

لأنّ ذاك العشق الحقيقي

Di Dadgeha evînê da
sed parêzer
nikarin bijangê çavê aşiq bilivînin
di dadgeha evînê da
aşiq ê ku biryara dawîkirina
dadgehê dide

في محكمة الحبّ

مئة محام

لا يستطيعون تحريك

رمشة عين العاشق

في محكمة الحبّ

العاشق من يصدر قرار إنهاء المحكمة

Hosteyê eşqê
ravekirina navê wî
helbestvan e
fitefîta evînê
di dilê evîndar da
dîtina dewleta evînê di nava xwînê da
helbestvan e
evîn ji her kesî ve nê xuyakirin
bi tenê helbestvan ew ê ku
her tşî veşartî di nava evînê da dibîne

ماهر العشق

شرح اسمه

شاعر

نبض الحبّ

في قلب الحبيب

رؤية دولة الحبّ وسط الدم

شاعر

لا يظهر الحبّ لكلّ شخص

فقط الشاعر هو من يرى

كلّ شيء مخفي وسط الحبّ

Di kelebuxa qehweya sibehê da
sema evînê dibînim
ji kefa şeraba romayê
lezeta evînê vedixwim
di şeveke sayî da
li ber çelengiya ezmên
mêjî , ziman û dilê xwe
bi meyê dişom

في بخار قهوة الحبّ
أرى سكرة الحبّ
من رغبة شراب روما
أشرب لذة الحبّ
في ليلة صافية
أمام جمال السماء
أطهر عقلي ولساني وقلبي بالخمير

Di her tiştî da
ez mindebûrim
lê di evînê da
ez dewlemendê jîngehê me
di hemî rîyan da ez ketim
lê dema ku ez ketim rîya evînê
hemî rîyên xawr
li pêş min rast dibûn

أنا مفلس
في كلّ شيء
بيدّ في الحبّ
أنا غني الكون
تعثرت في كلّ الطرقات
بيدّ عندما تعثرت
في طريق الحبّ
جميع الطرقات المتعرجة
استقيمت أمامي

Hezkirin şewq e
nayê vemirandin di jiyana mirov da
hezkirin dişebihe baranê
gulan li ser dilê mirov dibişkivîne
hezkirin weke avê
êgir vedimirîne
dil dibiriqîne
Û di hemû navên xwedê da xwe dibîne

الحبّ سراج
لا ينطفئ في حياة المرء
الحب يشبه المطر
يُزهر الورود في قلب المرء
الحبّ مثل الماء
يُطفئ النار
يُلمع القلب
ويرى نفسه في جميع أسماء الله

Şerqînî ji awirên evînê
dil xwe vedişêre
şerqînî ji awirên evînê
can ditevize
şerqînî ji awirên evînê
çav ji çelengiyê behredêr dibe

صاعقة من نظرات الحبّ

يختبئ القلب

صاعقة من نظرات الحبّ

يتخدر الجسد

صاعقة من نظرات الحبّ

تحرم العين من الجمال

Tîp li ser zimanê min dicirifin
bi livandina lêvên min bi navê evînê
dil weke zarokê birçî şîr diqîre
tîp di gewriya min da ase dibe
dema ku ji navê evînê behredêr dibe

تهتزّ الأحرف على لساني
بتحرك شفاهي باسم الحَبِّ
القلب مثل طفل جائع الحليب يصرخ
الأحرف تبقى معلقة في حنجرتي
عندما تُحرم من اسم الحَبِّ

Dibêjin evîndar Kor e
ew nizanin ku evînê çavên wî
ji eşqê weke Yaqûb kiriye
dibêjin dil derya ye
ew nizanin ku evîn zûha dike
dibêjin ku evîn mirovan zana dike
ew nizanin ku çep bizîvire mêjî jî dibe

يقولون بأنّ العاشق أعمى
لا يدركون بأنّ الحبّ قد
فعل بعينيه من العشق مثل يعقوب
يقولون بأنّ القلب بحر
لا يدركون بأنّ الحبّ يجفّه
يقولون بأنّ الحبّ يُثقف المرء
لا يدركون بأنّه عندما ينقلب
يأخذ العقل

Jiyana di evînê da gulistan e
gul têda ne 361
,her gulek bihnek û renek cûda ye
derbasbûn hêsan e
derketin jê mirin e

الحياة في الحبّ حديقة

فيها 361 وردة

كلّ وردة لها رائحة ولون مختلف

الدخول سهل

بيد أنّ الخروج منها صعب

Evîn Şewata havînê ye di dilê aşiqan da

Evîn nebuhar û nepayîz e

Evîn demîstan e ku hezkirîyê te xwe li te nepêçe

Evîn berate ye ku dilê evîndar nelipitîne

الحبّ حرقة الصيف في قلوب العشاق
الحبّ ليس ربيعاً ولا خريفاً
الحبّ شتاء إذا حبيبك لا يلف نفسه حولك
الحبّ جثة إذا لم يُحرّك قلب الحبيب

Evîn ne têlbîn e ku kengî tu bixwazî tu yî ser bibî

الحبّ ليس تلفازاً متى أردت قلبته

Her tişt t k di e
bi ten  e q dim ne
ji her ti t  ra temen heye
bi ten  e q b  temen e

كلّ شيء يزول

فقط العشق يدوم

لكلّ شيء عمر محدّد

فقط العشق ليس له عمر محدّد

Evîn weke katijmêrê ye
Ku raweste wê gerdûn wêran bibe

الحب مثل الزمن
إذا توقّف دُمّر الكون

Evîn dewleta bêleşger e
ti kes nikare wê dagir bike

الحب دولة دون جنود
لا أحد يستطيع احتلالها

Eşq dihêle ku mirov
bi xizaniya mêjiyê xwe
dewletekê bi rêve bibe
Eşq dihêle ku mirovê nezan
Pispor bibe di her karî da

يسمح العشق للمرء
بجهله بأن يحرك دولة
يسمح العشق للجاهل
بأن يصبح مختصاً في جميع المجالات

Eşq û helbest

di yek rojê da afirîn

Eşq û helbest

Ji bo rakirina kuştinê afirîn

Eşq û helbest

Ji bo temamkirina hev afirîn

العشق والشعر

خُلِّقا في يوم واحد

العشق والشعر

خُلِّقا لأجل محو القتل

العشق والشعر

خُلِّقا لأجل إتمام بعضهما

Evîn ji avê ye

mirov çiqas vedixwe jê têr nabe

الحبّ من الماء

مهما شرب منه المرء

لا يرتوي ظمأه

Hemî rê bi dawî dibin
bi tenê rîya eşqê bêdawî ye
hemî çirax, roj û heyv tîn vemirandin
bi tenê çira eşqê vêketî dimîne

جميع الطرقات تنتهي
فقط طريق العشق بلا نهاية
جميع الأضوية، الشمس والقمر
تُطفأ
فقط ضوء العشق
يبقى منيراً

Eşq nexuya ye rûyê wê
lê dilê mirovan ser piştê dixîne
eşq bê ziman û zar e
lê destlêdanê li dil dike
eşq kirasê xwe li mirovan dike
û li rex mirovan
li îşkenceya mirovan mêze dike

وجه العشق ليس واضحا
بيد أنه يُسقط قلب المرء
العشق بلا لغة ولسان
لكن يُؤثر على القلب
العشق يُلبس فستانه للمرء
وبجانب المرء
يشاهد عذابه

Sirûda mirovahiyê eşq e

Û bade ji eşqê çêbûye

Û eşq ji nefesa devê xwedê çêbûye

العشق نشيد الإنسانية
والخمر صنع من العشق
والعشق خُلِق من نفس الله

Hezkirin ji mirovan rê ye
Û eşq ji yeksicûdnasî rê ye

الحب للمرء
والعشق لتوحيد الأديان

Ku eşq xwe berdide dil
can Weke canê Eyûb
, kurm lê dibin mêvan
di Dest pêkê da mêjî dibe
Piştî hemî can dagir dike
û Zimên bi tenê ji mirov ra dihêle

إذا انتشر العشق في جسد المرء
أصبح الجسد مثل جسد أيوب
انتشر فيه الديدان
في البداية العقل
بعد ذلك يحتل الجسد برمته
فقد يُبقي للمرء لسانه

Aşiq nizane westabûn, birçîbûn çî ye
Ji mirinê natirse aşiq
dilê aşiq ji silorî germtir e
û ji qeşemê bihêztir e
bi hezaran car dibe şehîd
di ber navê eşqê da
,weke şehîd e aşiq

العاشق لا يعرف ما هو
التعب ، الجوع
العاشق لا يهاب الموت
فؤاد العاشق أحر من اللهب
وأقوى من الصقيع
يستشهد آلاف المرات
أمام اسم العشق
العاشق مثل الشهيد

Aşiq ji zarokê yek rojkî naziktir e
bê guneh e
nizane derew çî ye
çav û dilê aşiq ji selsebîlê zelaltir e
Dengê aşiq weke awaza neya sofiyan e
Xwedê tê da xuya dibe

العاشق أرق من طفل حديث الولادة

بلا إثم

لا يعرف ما هو البهتان

مُقلّة وفؤاد العاشق أعذب من

السلسبيل

صوت العاشق مثل صوت ناي الصوفيين

الله ظاهر فيه

Evîn rîyek e di navbera zerya û êgir da ye
ger tu rast neçî
Yan dê zerya te daqultîne
Yan dê agir laşê te bihilîne

الوجد طريق بين البحر والنار
إذا لم تسر مستقيماً
إمّا أن يبتلعك البحر
أو تذوبك النيران

Evîn û Welat weke hev in
yê ku evîna xwe bifroşe
ê welatê xwe jî bifroşe

الوجد والوطن متشابهان
الذي يبيع حبيبته
يبيع وطنه

Eşq xilata yezdan e ji mirov ra
ger mirov gunehan di mafê eşqê da bike
dijwarbûna jiyânê li jiyana xwe dike
eşq sirûş e
weke rewana şehîd e

العشق هديّة إله للبشر
إذا ارتكب المرء الذنوب بحق العشق
يُصعّب الحياة على حياته
العشق وحيّ
مثل روح الشهيد

Ceng bêjing e
الحرب مَنخَل

Ceng Ezmûna herî mezin e em tê da ne
ceng me fêrî gelek tiştan dike
tiştên ku temenek gerek bû ku em pêgihîştana
Cengê di du heyvan da em gîhandinê
,Ceng bêjing e

الحرب منخل

الحرب أكبر امتحان نُختَبَر به

تعلمنا كثير من الأشياء

الشيء الذي كان يلزمنا عمر

لنصل إليه

الحرب أوصلتنا إياه في شهرين

الحرب منخل

Ceng weke mirinê ye

Ne biçûk nas dike û ne mezin

Ceng xwe nas dike weke dogehê herdem birçiyê

الحرب مثل الموت
لا تعرف الطفل ولا الشيخ
تعرف نفسها مثل الجهنم
في كل الأوقات جائعة

Cengê hîşt ku em

ji odayên xwe

ji nivînên xwe

ji nivîsên xwe

hîşt ku em Ji xwe bitirsin

الحرب جعلتنا

نهاب عرفنا

أسرّتنا

كتاباتنا

جعلتنا حتى من ذواتنا نهاب

Ceng parsekan dewlemend dike di şev û rojekê de

الحرب تجعل الفقير يكون غنيا

بين ليلة وضحاها

Ceng dihêle ku bira kurta mirinê ji birayê xwe ra bikule

الحرب تجعل الأخ يحفر

جدث لأخيه

Ceng ji kurman xerabtir e ji canê me dixwe û haya me jê tine

الحرب أسوأ من الديدان

تأكل من جسدنا

دون أن ندرك

Ceng navê eşqê bi dengê xwe
ji tabiloya dilê me paqij dike ê

الحرب تطهر بصوتها اسم العشق من لوحة قلوبنا

Çawa em ê rûyê cengê ji bîr bikin û cengê rûyê dilovanî ji dilê
,me şiqitand

كيف ننسى وجه الحرب

والحرب مزقت من قلوبنا وجه الرحمة

Cengê rengê rûyê me
Rengê jiyana me
rengê xwarina me guhart
kesên ku berî cengê me dîtin
ew kesana ne kesên me dîtin
ew kesana bûne wehş

الحرب قد بدّدت لون وجهنا

لون حياتنا

لون طعامنا

الذين رأيناهم قبل الحرب

ليسوا بالذين رأيناهم

أصبحوا وحوشاً

Di cengê de me tiştên ji xwe mezintir dîtin
tiştên ku di filiman da naqewime me di cengê de dîtin

في الحرب رأينا ما هو أكبر منّا
رأينا ما لم يحدث في الأفلام

Derzîya pişta pêûsê şikest û zûha bû ji cengê

Peyv hatin hêrandin

Wêje rût û tezî bû

Xwendin, nivîsandin

di windabûnê da li xwe digerin

قد كُسر ظهر القلم وجُفَّ من الحرب

قد طُحَّنت الكلمات

الأدب قد جَرَّد

القراءة والكتابة

تبحثان عن نفسيهما في الضياع

Ceng mêran dadiqultîne û dihêle ku jin şerefa xwe bifroşe

الحرب تنهي الرجال
و تجعل المرأة تبيع شرفها

Ceng ferhenga stranên xweş ji mêjîyê me didize

الحرب تسرق قاموس الاغاني الجميلة من عقولنا

Ceng Lezeta Eşqê ji jiyana me didize û jehrî dixîne şûnê

الحرب تسرق لذة العشق من حياتنا وتبدده بالسّم

Di cengê de çav girî ji bîr dike
di cengê de çelengî xwe ji keçikan didize
di cengê de lezet di xwarinê da namîne

في الوغى المُقل تنسى البكاء
في الوغى يسرق الجمال ذاته من الفتيات
في الوغى لا يبقى للأكل لذة

Me cihenima birçî di cengê da dît em nexwarin lê em biraştin
Xwedê destê xwe ji vê cengê şuşt

رأينا الجهنم جائع في هذا الحرب
لم يأكلنا بيِّدَ أَنَّهُ أَفْحَمْنَا
حَتَّى اللهُ قَدْ يئس من هذه الحرب

Cengê bi dengê xwe

bîranînên me xewnên me tevahî xweşiya jiyana me heyiband

الوغي بصوته قد هجر ذكرياتنا

جميع آمالنا و جمال حياتنا

Bayê cengê temenê mirovan diderizîne

bayê cengê ramanên ramyar di dizê da dewlemend dike

رياح الحرب قد صدّعت عمر الإنسان

رياح الحرب تغني أفكار السياسيّ في الاختلاس

Ceng ji xwînê xortan hezdike
,Ceng dilê qîzikan sêwî dike ji Eşqê

المُلْحَة تعشق دم الشباب
المُلْحَة تبيِّم أفئدة الفتيات من العشق

Di cengê da dil , mêjî û hestên me pûçin

في المُلحة أفندتنا، عقولنا وأحاسيسنا مشلولة

Ezman ji toza cengê bi ser me da vedireşe

السماء تتقياً علينا من غبار الحرب

Şer zıqaq ji xortên temen sivik valakir

الوغي قد أفرغت الشوارع من الشباب

Di rezme da sûfetê însanan çîrokên êşê jê dibare

Di rezme da însan ji xwedê dixweze ku tineyî be

في المَلْحَة تمطر من وجه الإنسان حكايات الألم

في المَلْحَة يتمنى المرء من الله

لو لم يكن موجوداً

Şervanî xemgînîyê di mirov da diçîne
Şervanî fersendê nade ku mirov
çavên xwe ji darbestan dûrbixîne

الوغي يزرع الحزن في المرء
الوغي لا يسنح للمرء فرصة
بأن يبعد عينيه عن الضرائح

Rezme zanîne winda dike
nezanîne zêde dike
malbatan ji hev dixê
dil û rihê gur di rihê mirovan de gur dike

الحرب تُتِيهِ العِلْمُ
تزيد السفاهة
تفكك الأسر
يشتعل قلب ومهجة الذئب
في مهجة الإنسان

Şervanî qiyameta biçûk e
her kesê ku di şervanî da dijî
ne bi serê xwe ye, serxweş e, dîn e
nizane çi diqewime li ser gerdûnê

الحرب قيامة صغرى
كلّ من يتعاشى الحرب
ليس بوعيه
ثمل،أبله
لا يدرك ماذا يجري في الكون

Şer weke penceşêr e

xwe berdide bajaran û hêdî hêdî ji şengîya bajêr didize

الوغى مثل السرطان

تضع أوزارها في البلاد

رويدا رويدا تسلب جمال البلاد

Her rojek di herbê da
wek îşkenceya salekê di zîndanê da ye

كلّ يوم في المَحَّة
مثل عذاب سنة في المعتقل

Katijmêrek di rezmeya bêdeng da

,Ji cengê diwartir e

ساعةٌ في حربٍ بلاصوت

أصعب من الحرب

Êşeg û çîrokên cengê ji nivîskarê ku di cengê da mayî bipirsin, bi tenê ew dizane ku çi qewimî

أسأل حكايات وآلام الحرب
من كاتب الذي بقي في الحرب
وحده يعرف ماالذي جرى

Ceng xêr e ji dizan ra
şer e ji belengazan ra

الحرب خير للص
قتال للفقراء

Di şervanî da fotoğrafên bîranînên me tîn hilandin
di şervanî da bajar weke pûrteqalê tê qeşartin
di cengê da yê ku di êgir da avijnê dîkin dayîk in

في الحرب صور ذكرياتنا تنصهر

في الحرب البلد مثل البرتقال

يُقشر

في الحرب الأمهات من يسبحن في اللهب

Teqînên ku di bajêr da qewimîn lekeyên êşê li deriyê her malê
xist

teqînên ku di bajêr da qewimîn

rewan di cesedê me da hîşt lê dil cemidand

انفجارات التي حصلت في البلاد

أبقت آثار الحرب على كلِّ باب

انفجارات التي حدثت

أبقت الروح في جسدنا

بيد أنها جمّدت الفؤاد

şerê di vî bajarî da qewimî

ji dîwêr, ji derî, ji axa vî bajarî bipirsin ku çi li vî bajarî qewimî

الوغى الذى حصل في هذا البلد

اسألوا الجدران ، الباب ، التراب

مالذي حصل في هذا البلد

Ji dengvedana dengê cengê
piraniya qîzan bûne jin
ji dengvedana dengê cengê
gelek dayîkan zarok ji ber xwe avêtin

من صدی صوت الحرب
فتیات کُتُرُ أصبحن نساء
من صدی صوت الحرب
أمهات کُتُرُ
اجهضنَ مافی بطونهنَّ

Ezberkirin di şer da berî her tiştî tê kuştin

الحفظ في الحرب يتم قتله
قبل كل شيء

Rezme dawîya rêmankaran tîne

الحرب تأتي بنهاية المفكرين

Di dadgeha evînê da

sed parêzer

nikarin bijangê çavê aşiq bilivînin

di dadgeha evînê da

aşiq ê ku biryara dawîkirina

dadgehê dide

في محكمة الحبّ

مئة محام

لا يستطيعون تحريك

رمشة عين العاشق

في محكمة الحبّ

العاشق

من يصدر قرار إنهاء المحكمة

